Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1264 | 13-Nîsan-2025 | www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218


# Ev 40 sal in şanogeriyê dike

**Yûnis Ehmed serpêhatiyên civaka xwe bi rêya şanoyê digihîne cîhanê. Yûnis Ehmed ev 40 salin şanogeriyê dike û dibêje hîn gelek maye ku ew bigihêje asta şanogeriyê.**



Ev 40 sal in, temenê xwe ji bo hunera şanoyê pêşkêş kir da ku bibe neynika civaka xwe. Şanoger û derhêner Yûnis Ebd Elmecîd Ehmed di sala 1960‘an de li gundê Qijlê yê girêdayî navçeya Amûdê hatiye dinê. Lê belê ji dema temenê Yûnis 4 salî bû ew û malbata xwe ji gund bar kirin û berê xwe dan bajarê Hesekê. Yûnis ji hunera şanoyê pir hez dikir. Tim di zaroktiya xwe de xeyal dikir ku bibe şanogerek mezin û şagirtên wî jî çêbibin. Lê belê ji ber rewşa malbatê ya Yûnis xizan bûn, ew hêza pêşketinê jî li gel wan kêm bû. Yûnis Ehmed ji ajansa me re wiha qala rêwîtiya xwe ya ji bo şanogeriyê kir.

**‘Şoreşa bakur mîna volkanekê teqiya’**

Yûnis diyar kir ku jiyan zehmet e û her ku diçe zehmetir dibe, lê belê mirov dikare jiyanek xweş jî ava bike û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Ez biçûk bûm, ji bo min hunera şano eşq bû, lê kes bala xwe ne dida min. Malbata min hezkirina min a ji şanoyê re dizanîn lê belê ji ber rewşa madî û rejîma Baas nikarîbûn coşê bidin min. Di salên 1981-1982‘yan de bêhneke xweş ya şoreşê ji Bakurê Kurdisanê hat, em pir kêfxweş bûn. Di sala 1984‘an de ev şoreş mîna volkanekê teqiya û me jî xwe li ber têhna vê volkanê germ kir.

Di salên 1986-1987’an de me jinûve dest bi tevlîbûna şano kir, ez wê demê pir kêfxweş bûm ji ber ez tevlî komên şanoyê bûm. Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê re em pir bi hêz bûn. Wê demê hevrêyê me yê nemir Bavê Teyar hevalê me bû, wî em fêrî şano dikirin. Ez dikarim bibêjim ku keda nemir Bavê Teyar li ser şanogeran pir mezin e, bi rastî jî şanogeriya Kurdî bi navê Bavê Teyar pêş ket.

Ez tim dibêjim ku şano neynika civakê ye, mirov dikare bi gelek şêwazan berxwedaniyê bike û rastiya civaka xwe derxîne holê. Min xwest ku ez bi rêya dika şanoyê re vê rastiyê derxînim holê û bila her kes îradeya gelê Kurd nas bike. Ruxmî zehmetiyên heyî yên wê demê, lê em ranediwestiyan û me şanoyên xwe pêşkêş dikir. Rejîma Baas pir zor û êşkence bi taybet li ser gelê Kurd dida meşandin. Her car me di cejnên Newrozê de bi awayekî veşartî prova dikir. Rejîma Baas em fetisandin. Raste me pir zehmetî di wê demê de kişandin lê belê evqas zehmetiyên ku me kişandin ji bo me bû hêz da ku jiyana xwe dewam bikin û di demên pêş de xwe pêş bixin. Dika ku niha ez li ser şano ji gel re pêşkêş dikim, di dema rejîmê de ez jê mehrûm bûm. Ji bo min hisret bû ku li ser wê dikê şanoyekê pêşkêş bikim. Lê niha bi serbilindî û cesaretek mezin şanoya xwe li ser vê dikê ji hezaran kesan re pêşkêş dikim.”

**‘Me qalibê tirsê şikand’**

Yûnis Ehmed destnîşan kir ku piştî Şoereşa Rojava destpê kir derfetek herî mezin ket destê wan û êdî wan qalibê tirsê şikand û wiha axivî: “Belê ez zêdetirî xwe girêdayî beşê sînema me. Dema kes ji min re qala sînema dike ez pir kêfxweş dibin û kelecanek min digre. Wek şanoger çi ji me tê xwestin em dikin û heya ji me tê em erka xwe pêk tînin. Tim em dixwazin di Kurdistanê de xwe ava bikin ji ber Rêber Apo dibêje welatê avakirî be kes nikare wî welatî bişkîne. Bila her kes bizane bê zehmetî û êş mirov nagihêje xweşiyê.”

Yûnis diyar kir ku ew gelek cûreyên şano pêşkêş dike, hin caran siyasî û hin caran jî komedî, lê belê ev jî li gor rewşa civakê dimîne û wiha got: “Her kes nikare şano pêşkêş bike, tenê yê ku civaka xwe bi kuranî nas dike û karibe hestê civaka xwe derxîne pêş, dikare şano pêşkêş bike.

Ev 40 sal in ez karê şanogertiyê dikim lê belê ez hîn nebûme şanoger pêwîste ez hîn bêhtir ji civaka xwe re bikim. Pêwîste ez li hember gelê xwe bibim neynika civakê. Hêviya min ew e ku şanogeriya Kurdî hîn bêhtir pêş bikeve û ji tevahî hunera cîhanê re bibe mînak.” **ANF**

# Maneyên veşartî yên di sembolan de

**Navenda Nûçeyan**

**Li bajarê Sine yê Rojhilatê Kurdistanê hunermenda 28 salî Saba Moîn Afşar, yekem kes e hunera qewartina pênûsê dike. Saba Moîn Afşar bi xebatên xwe yên balkêş eleqeyek mezin bi jinan re dibîne.**

Saba Moîn Afşar ku perwerdeya mîmariyê temam kiriye, got: “Ji ber ku bingeha min mîmarî ye, me pênûs bi birekek diqewart. Bi fikrên ku tê aqilê min bi serê pênûsê min dest bi teşedayînên geometrîk ên weke kûp, pramître, kureyan kir. Bi her forma ku min ava kir nûbûnên cuda çêbûn. Piştre min serê pênûsê du rehend an jî şêweyên hundirê wê vala dayê. Min xebatên xwe yên hunerî piştî perwerdeya mîmarî di sala 2015’an de dest pê kir. Ev 5 sal in bi awayek profesyonel ez xebatên xwe didomînim. Min ev forma hunerê bi awayekî neteweyî tomar kir. Ez endama Fona Kredî ya hunermendan im û du berhemên min di pirtûka huner û hunermendan de hatin weşandin.”

**Balê dibe ser sembolan**

Saba Moîn Afşar diyar kir ku li Tehranê beşdarî pêşangehên cuda bûye û got: “Ceribandina min a yekem pêşangeha Panj Panj a li Pasdaran a li Tahranê bû. Cihekî ku enerjiya pozîtif dida min û ez riya xwe hê cidî û bi rêgez bişopînin hêz dida min bû. Niha cara yekem pêşangeha min li Sannayê hat vekirin. Pêşangehek ku balê dikşîne ser xaliyên çanda Kurd û sembolên di raçînên xaliyan de bû. Di nava sembolên ku min di berhemên xwe de bi kar anîn de îşaretên girêdayî hev ên weke xwarin, bereket û têgînên cihê jinan di jiyanê de, cih digrin. Raçînên xaliyên jinan ên demên berê û ji bo hunermendên din ên jin rêzî nîşan bidin û were ferqkirin ji bo min ecêb bû.”

**‘Wateya her sembolê heye’**

Saba Moîn Afşar bal kişand ser sembolên herî girîng ên xaliyên çanda Kurdî û got: “Yek ji van sembolan sembola xwedawenda bingehîn bû. Hemû kesên ku vê sembolê li ser xaliyan dibînin, jina ku xalî nexşand bi tenduristiya zarokên xwe re eleqedar dibe û bi vê fikarê xalî raçandiye wê fêm bike. Sembola kelemçe jî toqeyek ku jin dema porê xwe dikin kezî û di dibin keziyê de datînin e. Ev



toqe ne tenê xweşiktiyek asan e, tê de peyamek veşartî heye. Îşareta hezkirina toqeyê, hêvî yan jî kêfxweşî ye. Di hinek xaliyan de sembolên weke ejderha û çûk hene. Mexlûqên efsane yên ku sê ling û nukulek wan a diyar û gewdeyek sê goşeyî, di çar aliyên xaliyê de bi awayek sîmetrîk hatine bicihkirin. Raçîner bawer dikirin ku ev şekil mertalek li pêşiya nezer û mexlûqatên bi jehrî ye. Ji bo malbatan parêzvanên bêdeng bûn. Sembola çûkan jî xeberdariya dua bû. Daxwazek ji bo hezkiriyên wan vegere bû. Hinek van sembolan di heman demê de weke îşareteke azadî û rizgariyê didîtin. Di bêdengiya dezgehên xaliyan de sembolên çûkan dihatin raçandin, daxwazek ji bo rizgarbûna ji zextê ye.”

Sudoku: Bersiv 35

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 8 | 3 | 5 | 7 | 4 | 1 | 6 | 9 |
| 6 | 4 | 7 | 9 | 8 | 1 | 3 | 2 | 5 |
| 5 | 1 | 9 | 2 | 6 | 3 | 8 | 4 | 7 |
| 8 | 2 | 5 | 7 | 3 | 9 | 4 | 1 | 6 |
| 9 | 6 | 4 | 1 | 2 | 5 | 7 | 3 | 8 |
| 7 | 3 | 1 | 8 | 4 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 3 | 9 | 6 | 4 | 5 | 8 | 2 | 7 | 1 |
| 1 | 5 | 2 | 3 | 9 | 7 | 6 | 8 | 4 |
| 4 | 7 | 8 | 6 | 1 | 2 | 9 | 5 | 3 |

Sudoku:Pirs 36

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 5 | | | 6 | 1 | | 4 | 7 |
| | | 9 | | | | | | 8 |
| 2 | | | | 8 | | 5 | | |
| | | 3 | | | | | | 1 |
| 1 | 7 | | 2 | | 8 | | 3 | 5 |
| 8 | | | | | | 7 | | |
| | | 2 | | 4 | | | | 3 |
| 6 | | | | | | 4 | | |
| 4 | 1 | | 7 | 2 | | | 9 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Wê roja te jî were:**
- Dema yek tiştekî ji yekî dixwaze û yê din daxwaziya wî pêk nayne hingê dibêje.

**Wê roja wî were:**
- Dema yek xirabiyê dike û behsa xirabiya wî tê kirin hingê derbarê wî de tê gotin.

**Wisa neke ku pîvazan tevan spî bikim:**
- Ez naxwazim her tiştî eşkere bikim; gelek tiştên ku ez naxwazim bêjim hene.

**Wisa neke ku em bêjin mast:**
- Wisa neke ku em rast bêjin.

**Wisa neke ku kêliyên kevin bibişkêvim:**
- Wisa neke ku ez sûcên te yên kevin bêjim.

**Wisa neke ku kêlîyên berê verêsim:**
- Bi heman wateyê.

**Wisa neke ku li binê kundir bixim:**
- Bi heman wateyê.

**Awirên xwe revandin:**
- Şerm kir; li ber xwe ket.

**Berrik di bin me de nehişt:**
- Em rezîl kirin; ji ber kiryarên wî em şermezar bûn; kumê me li erdê xist; em hetikandin.

**Çavên wî şor bûn:**
- Şerm kir; li ber xwe ket.

**Çavên xwe nizim kirin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe şkandin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe revandin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe şor kirin:**
Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Tirkiyê li hember projeyên çareseriyê di Sûriyê de dibe asteng’



Endamê Partiya Yekîtiya Demokrat Reşîd Ehmed da zanîn ku Tirkiyê li hember projeyên çareseriyê di Sûriyê de dibe asteng û got: “Heta çareserî di Sûriyê de pêkan be, pêwîst e destwerdana Tirkiyê bidawî bibe û lihevkirinên hêzên navxweyî pêş bikevin”.**R-3**

## Banga dîrokî ya Rêber Apo

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê yê bajarê Dêrikê Mihemed Ebdulrehman diyar kir ku 27’ê Sibatê rojeke dîrokî bû, mohra xwe li dîroka cîhanê xist û wiha got: “Banga Rêber Apo ne tenê di dîroka Kurdistanê de, lê di dîroka tevahiya herêmê de rûpeleke nû dest pê kir.”**R-4**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1264 | 13-Nîsan-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




## Ji bo parastina rojnamevanan yekîneya taybet hate avakirin

Rêveberê Yekîneya Şêwermendiya Ewlehî û Parastina Rojnamevanan Ehmed Mihemed wiha got: “Ji ber şert û mercên zehmet ê ku rojnamevan tê de derbas dibin, Raghandina Azad Yekîneya Parastina Rojnamevanan ava kir.**R-5**

# YEKRÊZIYA KURDÎ BINGEHA SÛRIYEKE DEMOKRATÎK E

Piştî hilweşandina rêjîma Baas, ji bo yekrêziya kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek hewldan hatin kirin. Çav li rê bû ku encamên danûstandinan û reşnivîsa yekîtiya partî, hêz û rêxistinên kurdî di Newrozê de hatibana eşkerekirin, lê komîteya amadekar ji ber hin astengiyan eşkerekirina encamên diyalogê taloq kiribû. Li ser daxwaza gel; hêz, partî û rêxistinên siyasî yên kurdî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser belgeya yekîtiyê li hev kirin. Herwiha tê texmînkirin ku di demeke nêz de Konferansa Neteweyî ya Kurdî bê lidarxistin.**R-4**






## ‘Lêkolînê 7 hezar û 149 nexweşên penceşêrê li Rojava tomar kirin’

Bijîşkê kurd Ridwan Mihemed eşkere kir ku li Rojavayê Kurdistanê 7 hezar û 149 kes bi dirêjahiya salekê bi nexweşiya penceşêrê ketibûn û got, “Rêjeya nexweşiya penceşêrê li cem jinan ji ya mêran bilindtir bû, rewşa penceşêrê li Rojava xeternak e û divê nexweşxaneyên ji bo dermankirina penceşêrê bên avakirin.”**R-6**



**Banga Aşîtî û Civaka Demokratîk Tekane Altirnatîfa Gelan E**
Idrîs Henan R-5



## ‘Eger ziman di onlinê de nekeve xizmeta civakê wê pûç bibe’

Berdevkê Pilatforma Zimanê Kurdî ya li Ewropayê Lezgîn Botan destnîşan kir ku berî salekê amadekarî ji bo lidarxistina konferansa bikaranîna zimanê kurdî di zîrekiya çêker de tê kirin û got, “Eger zimanê kurdî di onlinê de bi durstî û anistî nekeve xizmeta civakê de wê pûç bibe.”**R-7**

# Weqfa Jina Azad bi nasnameya jinê kar dike

Weqfa Jina Azad A Sûriyê di îlona 2014'an li ser bingeha piştgiriya jin û zarokan ku rola jinê bi wê bide naskirin û zarokan li cihên ewle bicih bike hate damezrandin. Herwiha di nava Weqfa Jina Azad de gelek komîte hene û xebatên van komîteyan bi nasnameya jinê tê meşandin.

**Navenda Nûçeyan**

Weqfa Jina Azad di Îlona 2014'an de di bin dirûşmeya "Jina Azad Bingeha Civaka Azad e" hate damezirandin. Xebatên wê li ser pêşxistina jinan di aliyên aborî, çandî, civakî û tenduristî de armanc dike. Herwiha bibe piştgirî ji bû hemû jinan, bi taybetî jinên Sûriyê. Weqfa Jina Azad di destpêka avakirina xwe de ne ya Sûriyê bû, lê piştî ku pêşketinên mezin di seranserî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de pêk hat û ji bo ku ev pêşketin bigihîjin hemû jinên li Sûriyê, di konferansa sala 2021'ê de bi biryarekê navê wê bû "Weqfa Jina Azad a Sûriyê."

**Avakirina Weqfa Jina Azad a Sûriyê**

Bii rêya belavkirina rapirsînekê an inkêtekê ku li ser 300 jinan hate belavkirin, li gorî wê Weqfa Jin hate damezrandin. Armanc û bingehê xebatên Weqfa Jin jî pêşkêşkirina projeyan ji bo jin û zarokan ne. Ji ber di dema rûdana şeran de yên herî zêde zirar li wan tê kirin jin û zarok in, lewra Weqfa Jina Azad xwest di vê derbarê de kar û xebatên xwe bide meşandin.

Weqfa Jina Azad a Sûriyê saziya civaka sivîl e, ne girêdayî tu aliyekî ye. Bi nasnameya jin kar dike. Herwiha hewl dide xwe bighîne hemû jinên li Sûriyê û bi wan re bibe alîkar. Navenda Sereke ya Weqfa Jina Azad a Sûriyê li bajarê Qamişlo ye. Ofîsên pêve girêdayî jî hema hema derbasî Sûriyê giştî bûye ku ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Li Dêrik, Girk Legê, Çilaxa, Dirbêsiyê, Hesekê, Reqa, Tebqa, Kobanê, Sirîn, Heleb, niha jî ew hewil didin şaxê xwe li Şamê jî vekin. Li kampan jî şaxên wê hene weke Kampa Hol, Roj û Waşokanî. Karê ku li navenda sereke tê kirin li kamp û ofîsan jî tê kirin. Li kêlek van jî keskesor "Dar El-eytam" li Kobanê heye, zarokên bê kes ên dayik û bavên wan di şer de şehîd bûne, an jî malbatên wan li wan xwedî dernakevin Weqfa Jina Azad li wan xwedî derdikeve.

**Komîteyên Weqfa Jina Azad a Sûriyê**

Di nava Weqfa Jina Azad de gelek komîte hene; mîna Komîteya Perwerdê, Komîteya Tenduristiyê, Komîteya Proje, Komîteya Diplomasî û her komîteyek ji van komîteyan jî xebatên wan ên tewrîk û pratîkî hene. Mînak Komîteya Perwerdê tewrîkên wê li ser semînerên hizrî û hişyarîkirina jinan ji bo pêşketina hişmendiya wê. Di heman demê de ku ev perwerde bibin alîkar ku jin rola xwe ya di nava civakê de nas bike û erkên xwe nîşan bide. Ji ber ku bi hezarên salan jin rola xwe ya rast di nava civakê de winda kiribû, her tim xwe di asta duyemîn de didît, tiştên ku li ser wê hatibûn ferzkirin jî li ser xwe weke erk didît, lê mafê xwe nas nedikir û ne didît. Lewra Weqfa Jina Azad xwest mafê jinê bi jinê bide naskirin.

**Xebatên komîteya Perwerdê yên tewrîk û pratîkî**

Beşê perwerdê yê pratîkî li ser bingeha ku bi jinên karker re alîkarî bê kirin. Ji ber bi Şoreşa Rojava re rêjeke mezin ji jinan ku ji sedî 80 jin derbasî kar bûn. Lewma ji bo ku zarokên jinên karker li cihekî bi ewle bin, Weqfa Jina Azad bexçe û himêzgeh ji zarokan re ava kirin. Li kêlek wê peymangehên muzîkê yên zarokan jî hatin avakirin, bi taybetî ji zarokên koçber re. Di heman demê de Hola Werzîşê ya jinan jî hate vekirin.

**Xebatên komîteya Tenduristiyê yên tewrîk û pratîkî**

Komîteya Tenduristiyê jî heman rêbazê komîteya perwerdê xebatên tewrîk û pratîkî didin meşandin. Tewrîk wê semînerên hişyariyê yê tenduristiyê dide jinan, ji bo malbat û civakên bi tendurist werin avakirin. Car caran bi kampaniyan jî radibin, mîna kampaniyên penceşêra sedî û kampaniyên nexweşiyên bi



demê re belav dibin. Ji bo beşê pratîkî jî nexweşgeh, kilînikên gerok, tenduristiya xwezayî û destwerdana lezgîn heye.

Nexweşgehên Weqfa Jin, jin û zarokan tedawî dikin û derman bê dirave belav dikin. Nexweşgehên heyî jî li Qamişlo, Gundê Tebkê yê girêdayî Koçerata, Hesekê, Dirbêsiyê û li Kobanê hene. Kilînîkên Gerok jî li gundewarê bajarê Dêrikê heye. Tenduristiya Xwezayî jî li Dirêbsiyê û Hesekê heye. Herwiha armanca tenduristiya xwezayî jî ew e ku çanda xwezayî ya ku jin keşf kirî û tê de kar kir, derxin pêş, di vê derbarê de jî berhemên gelekî baş di nava civakê de hatin xuyakirin.

Destwerdana Lezgîn jî li ser du beşan heye; Beşa yekê jinan fêrî destwerdana lezgîn dikin, da ku karibin bibin alîkar bi derdora xwe re. Beşa din jî li ser 6 mehane ku jinên vê beşê dikarin bibin weke alîkarên bijîşkan.

**komîteya Proje**

Komîteya Proje jî tewrîk û partîka wê heye. Tewrîka wê rapirsînek an jî inkêtan li jinan belav dike û li gorî van inkêtan projeyan pêşkêş dike. Di heman demê de li gorî xwesteka jina perwerdeyan vedike. Hemû Ofîsên Weqfa Jina Azad jî di vê derbarê de kar dikin. Meşxeleke dirûtinê ya Weqfa Jina Azad li Qamişlo heye. Ofîsên din jî perwerdeyan vedikin. Li kêlek wê korsên fêrkirina zimanan jî tên vekirin, mîna zimanê inglîzî, kurdî, erebî û hasûb.

**Komîteya Diplomasî**

Di rêya beşê dipolmasî de têkiliyên Weqfa Jina Azad bi rêxistinên hundir û dervere tê xurtkirin.

# 'Ji bo misogerkirina mafê jinên kedkar xebat tên meşandin'

**Navenda Nûçeyan**

**Rêvebera Yekîtiya Kedkaran ya bajarê Qamişlo Şehnaz Elî Mehmê tekez kir ku ew ji bo misogerkirina mafên jinên kedkar xebatên xwe zêdetir dikin."**



Ji bo pêşxistina aboriyê û avakirina kesayeteke serbixwe, jin di nva hemû karan de cihê xwe digrin, jin di kargeh, nangêj, çandinî, sewaldarî û ...hwd de cihê xwe digrin û kar dikin. Yekîtiya Kedkaran jî ji bo jinan derfeta kar peyda dike û ji bo parastina mafê jinan kar û xebatê dide meşandin.

Derbarê kar û xebatên Yekîtiya Kedkaran, bi taybet di milê parastina mafê jinên kedkar de, rêvebera Yekîtiya Kedkaran ya bajarê Qamişlo Şehnaz Elî Mehmê ji rojnameya me re axivî.

Şehnaz Mehmê diyar kir ku hejmara jinên kedkar li ser asta bajarê Qamişlo gihaştiye 10 hezar jin û wiha domand: "Em kar ji van jinan re peyda dikin di kargeh, kampanî, nanpêj, paqijî, çandinî û sewaldariyê de. Carnan rêxistinên di herêmê de kar dikin komên kedkar ji yekîtiyê dixwazin, ji hêla xwe ve em kedkaran diyar dikin û bi taybet em jinan didin pêş, ji ber ku hin jin hene rewşên wan yên aborî zehmetin û malbatên xwe xwedî dikin."

Şehnaz Mehmê destnîşan kir ku gelek kedkar di nav de jin berê xwe didin yekîtiyê da ku ji bo wan kar bê peydakirin û wiha lê zêde kir: "Em di destpêkê de navên wan tomar dikin û nasnameyê ji wan re çê dikin, piştre çi kar bê xwestin em ji wan re peyda dikin. Armanca me ji çêkirina nasnameyê ew e



ku kedkar girêdayî yekîtiyê bin û eger zirar bigêje kedkara jin em karibin parastina wê bikin."

**Ji bo şopandina rewşên jinên kedkar serdan tê kirin**

Şehnaz Mehmê da zanîn ku ji bo ew rewşa jinên kedkar nasbikin, serdana cihê kar dikin û wiha domand : "Da ku em rewşa kedkaran ya kar nas bikin, şêwazê danustendina bi wan re bibînin û pirsgirêkê ku derdikeve pêşiya wan çareser bikin em serdana cihê kar dikin û jinan dişopînin. Herwiha civîn ji kedkaran re tên lidarxistin da ku ew gilî û gazinên xwe bînin ziman, di heman demê de mijara fonên wan tê nîqa kirin. Em hewil didin pirsgirêkên wan çareser bikin. Têkiliyên me rasterast bi kedkaran re û xwediyên kar re heye. Em dixwazin tekez bikin ku aliyeke heye mafê kedkaran diparêze û eger zirar bighêje jina kedkar wê hisab ji kesê sucdar bê xwestin."

Şehnaz da xuyakirin ku pirsgirêkên ku li cem yekîtiyê neyên çareserkirin ew wê pirsgirêkê ji bo dadgehê rêdikin û axaftina xwe wiha qedand: "Hin qanûn tên amadekirin di navbera yekîtiyê û rêveberiyên kar de. Herwiha xebat tê kirin ji bo heqdestê jinê wekhevî yê mêr be, ji ber ku li gorî şopandina me hin alî hene çiqas jin kar dike bi seatên dirêj lê heqdestê wê kêm e, bi awayekî biçûk lê meyze dikin. Kedkarên jin yên ku di karê çandiniyê kar dikin me heqdestê wan diyar kiriye, ji ber ku piraniya xwediyên erdan mafê wan dixwarin. Nirxê heqdestê wan hate diyarkirin, çi bi rojan be an bi saetan be. Em hewil didin ku zêdetir kar û xebat ji bo misogerkirina mfên kedkaran bikin, bi taybet mafê jina kedkar. Emê heta dawiyê piştgiriya jinên kedkar bikin."



# 'Eger ziman di onlinê de nekeve xizmeta civakê wê pûç bibe'

Berdevkê Pilatforma Zimanê Kurdî ya li Ewropayê Lezgîn Botan destnîşan kir ku berî salekê amadekarî ji bo lidarxistina konferansa bikaranîna zimanê kurdî di zîrekiya çêker de tê kirin û got, "Eger zimanê kurdî di onlinê de bi durstî û anistî nekeve xizmeta civakê de wê pûç bibe."



**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Di rêveçûna cîhana teknolojî de li gel jiyana civakê ku piranaiya deman, mirov karûbarên xwe bi riya mediyaya dijîtal dide meşandin. Her mirovek bi zimanê xwe li ser mediyaya dijîtal û bernameyên zîrekkariya çêker wergerê dike, raporan dinivîsîne, fêrî zimanên cuda dibe û hwd… tenê gelê kurd bêpar e ji vê yekê. Da ku gelê kurd û kesên ku bi kurdî dinivîsînin û diaxivin, bi rêkûpêkî bernameyên internet û zîrekkariya çêkirî bikar bînin, hewldan tên kirin.

Yek ji van hewldanan jî ew e ku wê di 25 û 26'ê Nîsanê de konferansek ji hêla Pilatforma Zimanê Kurdî ya li Ewropayê û Foruma Elmanî-Kurdî ve û bi piştgiriya Şaredariya Dresdenê li dar bikeve. Konferans bi durşmeya 'Bikaranîna Zimanê Kurdî Di Zîrekiya Çêkirî De' wê li Elmaniyayê, bajarê Dresdenê li dar bikeve.

Derbarê lidarxistina konferansê, berdevkê Pilatforma Zimanê Kurdî ya li Ewropayê, Lazgîn Botan ji rojnameya me re axivî.

**'Ev saleke amadekarî ji bo konferansa zimanê kurdî tê kirin'**

Lezgîn Botan destnîşan kir ku berî salekê amadekarî ji bo lidarxistina konferansa bikaranîna zimanê kurdî di zîrekiya çêker de tê kirin û wiha got: "Wekû hûn ji nêz ve dişopînin piştî salên 2000'î cîhaneke nû ava bûye, ew jî cîhana hizrî ye. Di vê cîhana nû de di hemû qadên jîyanê de şoreke mezin çêbûye û taybetî guhartinên gelek mezin di qada teknolojîyê de rûdan. Weke Internet û operatorên pêve girêdayî. Mînak aborî, huner, perwerde, werzîş, zanist, helwest(sîyaset) û hwd... lewma jî di qada Internetê de pir bilez pêş ket. Bêguman bernameyên bingehîn ên nivîsandinê roleke giranbuha ya sereke dilîze. Ev programên nivîsandinê zimanekî nû yê gerdûnî diafirîne. Her miletek bi zimanê xwe di vê cîhana hizrî de (Cîhana Dijîtalîzekirî) bi rêbazên akademîk û xurt ciyê xwe digire. Berî saleke me jî weke Pilatforma Zimanê Kurdî ya li Ewropayê û Foruma Elmanî-Kurdî dest bi xebatan kir. Ji bo ku zimanê kurdî jî di van qadên Internetê de ango dijîtalîzasyonê de bi her çar zaravên xwe ve û bi awayekî xurt û akademîk cihê xwe bigire, bêkaranîn û li pêş bikeve, hem jî ji bo ku em bingehekî xurt û zanist ava bikin, em ê 25 heya 26'ê Nîsana 2025'an konferansê li dar bixin."

**'Eger ziman di onlinê de nekeve xizmeta civakê wê pûç bibe'**

Botan diyar kir ku eger zimanê kurdî di qadên onlinê de nekeve xizmeta civakê wê pûç bibe û wiha domand: "Armanca me di qada jîrîtiya afirandî û hemû operatotên internetê de zimanê kurdî bi her çar zaravayên xwe ve zanistî, rast û durist were bikaranîn. Cîhan êdî ne cîhana berê ye, cîhan cîhana dijîtalizasyonê ye. Mirovahî êdî di serdema fezaî, nanoteknolojî û zanistê de dijî. Ticaret, danûstandin, perwerdeya onlinê û herwiha hemû beşên jîyanê li ser teknolojîyê bi hêl diherike û tê meşandin. Zimanên di vê qada teknolojîyê de cih ne be û neyê bikaranîn û nekeve xizmeta civakê û mirovan, mixabin wê pûç bibe. Ji ber vê yekê jî konferansek ji bo zimanê kurdî wê bi beşdarbûna ji her çar alîyên Kurdistanê were lidarxistin. Ev kes pisporên û zanayên teknolojî, afrînerên programan û zimanzan in. Tevahî mêvanên me akademîsyen in. Hinek ji wan kurdîzan in ango kurdolog in. Akademîsyenên ji German û Holandayê jî hene. Bê guman ev konferans ji akademîsyen û bisporên soran, kurmanc, zaza û hewreman pêk tê."

**'Wê komîte ji bo mijarên ziman û onlinê bên avakirin'**

Berdevkê Pilatforma Zimanê Kurdî ya li Ewropayê, Lazgîn Botan da zanîn ku piştî lidarxistina konferansa zimanê kurdî wê komîte ji bo xabata bicihkirina zimanê kurdî di zîrekariya çêker de ava bibin û wiha anî ziman: "Gelê kurd bi mîlyonan li diasporayê dijîn pêdiviyekî mezin bi wergera ziman heye lê mixabin zimanê kurdî pir qels e di vî warî de. Perwerde êdî bi rêya onlîne tê dayîn lê bingeha zimanê kurdî li ser onlinê pir lewaz e, her kes medya civakî bi kar tîne lê belê zimanekî tevlî hev û aloz e. Heger di vî warî de em rêgehekî zanist bihonînin wê demê her kes wê ziman rast û baştir bikar bîne. Em ê hewi bidin ku di qadên hemû operatorên internetê de hemû zaravayên kurdî cî bikin û bêkaranîn. Ji bo vî karî jî mînakên gerdûnî hene, wek zimanê fransî, germanî, çînî, rusî û ingilîzî çawa û bi kîjan rêbazan hatine dijîtalîzekirin, wê zimanê kurdî jî heman rengî be. Di vê qadê de tercûbe û ceribandinên heyî wê bi me re bên parvekirin. Bisporên teknolojîyên zanistê û bisporên ziman bi hev re li ser bernameyekê ji bo zimanê kurdî kar bikin da kû hemû zaravayên kurdî bigehin standardekê û bi hev re bên karanîn. Piştî konferansê komîteyên li ser van mijaran bixebitin wê werin damezirandin û bi awayekî zanist û bisporî bi zanîngeh û kurdîzanan re wê xebat bê destpêkirin."

# 'Ji bo pêşxistina asta rewşenbîrî wergerandina berhemên wêjeyî pêwîst e'

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Nivîskar û lêkolînerê kurd Mehmûd Ebdo diyar kir ku di dema rêjîma Baas de xebatên wêje û rewşenbîriya kurdî piştperdeya veşartî û bi ferdî dihate kirin, lê piştî şoreşê pêşketina xebata rewşenbîrî pêk hatiye û got, "Êdî xebatên rewşenbîrî bi rengê giştî tê kirin, lê wergerandina berheman pêwîst e da ku hembêzî çanda cîhanî bikin'**

Ji bo her mirov an jî civakekê, xebatên rewşebîrî û wêjeyî pêwîst e ji ber ku rewşenbîrî zanebûna ziman, çand û huner, dîrok, erdnîgarî, têgihiştina netewbûn û zanistiyê ye. Gelê kurd bi salan ji ber rêjman Baas a desthilatdar ji qada rewşenbîrî û wêjeyî ve hatibû dûrxistin û di odeyên tarî pişt perdê bi ferdî xebatên xwe yên wêjeyî dikirin. Ji ber vê desthilatdariyê heya niha xebatên rewşenbîrî û wêjeyî yên kurdî di nava yê cîhanî de ne naskirî ye. Lê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştî lidaxistina şoreşê gavênavêtin di vî warî de hatiye kirin, gavên diyar û xuyayî jî avakirina sazî û dezgehên rewşenbîr û wêjeyî ne.

Derbarê kar û xebatên rewşenbîrî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, nivîskar û lêkolînerê kurd Mehmûd Ebdo ji rojnameya me re axivî.

**"Zêdeyî 10 salan pêşketina xebatên wêjeyî û rewşenbîrî pêk hatiye'**

Mehmûd Ebdo diyar kir ku şoreş gaveke girîng ji bo pêşketina xebatên wêjeyî û rewşenbîrî bû û wiha got: "Asta wêjeya kurd beriya Şoreşa Sûriyê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê û piştî wê çûda bû. Beriya niha di dema rêjîma Baas de wêjeya kurdî weke wêje nebû, tenê hin tişt di odeyên tarî, pişt perdê û bi ferdî bû. Tiştekî giştî ji bo xebatên wêjeyî nebûn. Tenê carcaran festîvala helbesta kurdî ya salane dihat çêkirin. Lê piştî şoreşê û di dema niha de bi rengekî baş pirtûkxaneyên kurdî bi pirtûkan hatiye dagirtin, berhem jî li seranserî Sûriyê li Şam, Heleb, Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde bûne. Herwiha ev zêdeyî 10 salan li ser vê komxebatê derbas bûyî êdî em Karin berhemên baş û nebaş ji hev cûda bikin. Di heman demê de di zêdeyî 10 salan de hewldanekî baş di warê wêjeyî, rewşenbîrî û ziman hate kirin. Bi taybetî avakirina sazî û yekîtiyan çê bûn, festîval hatin lidarxistin, ev hemû hewldanek hat kirin di aliyê ziman de û ziman heta wetekî baş rûnişt wek civak, xwendin, dibistan, zanîngeh û hwd…

Piştî avakirina sazî, dezgeh û navendên çandê karê di odeyên tarî de dihat kirin bû fermî. Herwiha da ku ev sazî werine rûniştandin dem jêr pêwîst dike, ji ber ku bi carekê xwîner, rewşenbîr û pirtûxane nayê avakirin. Li ser vê bingehê jî jinûve hevnasiyek çû ku nivîskar hev nas bikin. Rêkilam û ajansên kurdî hatin destpêkirin. Rojnamegeriya kurdî pêşveçû û rojnameya kurdî wek rojnameyên rojane derdikevin. Xwendin û têkilî çêbûn. Derfetên weşanê ferehtir bû, bi wê firebûna derfetan jî berhem, nivîskar û xwendevan jî pirtir bûn."

**'Bi rêya wergerê zimanê kurdî hembêzî çanda cîhanî bikin'**

Ebdo eşkere kir ku kedeke mezin a deste û saziyên bi çand û wêjeyê ve girêdayî ne tê kirin û wiha got: "Hemû deste û saziyên bi çand û wêjê ve girêdayî kedeke baş û mezin kirine. Ev yek jî xuyayî di pirtûxane û ziman kurdî de, lê hîn nebûye dîmenek saxlem ê ku em dixwazin çê bibe. Ji ber ku wêneyê wêjeya kurdî û şopa tilî li cem wêjeya Sûrî û cîhanî hîn zêde ne xuyayî ye. Lewma kar û xebat pêwîst e, erê sazî hatine avakirin, lê werger gereke, da ku berhemên me ji kurdî wergerî zimanê dîtir bibin û bi vê yekê em karibin zimanê kurdî hembêzî çanda cîhanî di rêya wergerê de bikin. Lewra di demên bê de divê em hewldanên baş di aliyê wergerê de bikin. Civaka kurdî civaka gelê bindest e, ji ber vê yekê wê bandoriya vê bindestiyê li ser nivîskar, rewşenbîr, wêjevan û hwd… yê civaka gelê bindest di berhemên wî/ê de diyar be, ji ber ku wê nîzîkî gelê xwe be û bibe wergervan ji wê êşê re. Mîna di huneriya afrîneriyê de tê gotin; rastî rastbawerî û rasbaweriya sosyalîzm, mirovê kurd nikare ne rastbawerî be yan jî ne nêzîkî civaka xwe be. Herwiha gelê kurd di rêya êş û dîroka neqheqiyê ya ku di dîrokê de bi ser wan hatiye, li ser hev kom kirine, dikin wêje û tên wergirandin.

**'Ji mafê nivîkare pirtûkên wî werin xwendin'**

Mehmûd Ebdo axaftina xwe wiha qedand: "Tiştî herî pêwîst û baş hewldan ji bo nifşên nû li zanîngehan were kirin ku jêhatiyên wan werin xuyakirin û ji wan re werşat werina avakirin. Li Rojava xebatên vê yekê heta astekê baş bûne, lê di warê bazar û wergerê de kêm mane. Ez ne li ser bazar di mal de dibêjin, lê di mal û derve de mînak niha pirtûkek hat weşandin li ser bergê pirtûkê jimara navnetewî û jimara pirtûkê heye. Lê pirtûkên me yên derdikevin xwechîne praniya wan beşdarî pêşengehên navdewletî nabin, divê ew jimara



navnetewî û mafê çapkirinê ji nivîkaran re bê dayîn, mafê nivîskar, pirtûk û weşanxaneyê winda nebe. Mafê nivîskare ku gel pirtûka wî/ê bixwîne, herwiha ew pirtûk jî pirtûkaderbasî hemû pêşengehan bibe. Da ku cîhanî wî nivîkarî û wê wêjeyê nas bikin. Ev jî dibe erkê Desteyên Çandê û Rêveberên Saziyên Rewşenbîrî. Di heman demê de di gelek dewletan de xebatên baş ji bo wêneyên dîtbarî yan jî dîzaynerê berheman tê kirin, mîna cûreya pirtûkê, berg, kaxez û jimarê ku derkevin xwîner bixwînin, çi bandorê li civakê bike, lê di vî alî de em kêmin ji ber ku em sûdê ji medayay civakî nakin ku wê bikin ware bazara berhemên xwe."

# ‘Lêkolînê 7 hezar û 149 nexweşên penceşêrê li Rojava tomar kirin’

Bijîşkê kurd Ridwan Mihemed eşkere kir ku li Rojavayê Kurdistanê 7  hezar û 149 kes bi dirêjahiya salekê bi nexweşiya penceşêrê ketibûn û got, “Rêjeya nexweşiya penceşêrê li cem jinan ji ya mêran bilindtir bû, rewşa penceşêrê li Rojava xeternak e û divê nexweşxaneyên ji bo dermankirina penceşêrê bên avakirin.”

Reşo Mihemed/ Qamişlo

Lêkolîna belgekirina hejamara nexweşên penceşêrê li Rojava xebateke girîng bû ku bijîşkê kurd, Ridwan Mihemed di sala 2023’an de dest pê kir. Da ku nexweşiya penceşêrê, xeterî, çareserî û hejmara kesên ku vê nexweşyê bi xwe re hildigirin û pê dinalin bide diyarkirin, wî rewş li Rojava şopand jêder û çavkaniyên xwe amade kirin. Di encamê de lêkolînek amade kir û ji bo raya giştî belav kir. Derbarê vê lêkolînê de bijîşkê nexweşiyên jinan Ridwan Mihemed ji rojnameya me re axivî.

**‘Lêkolîn ji sala 2023’an heya 2024’an bû’**

Ridwan Mihemed diyar kir ku bi dirêjahiya sala 2023’an û 2024’an li Rojavayê Kurdistanê lêkolînek ji bo nexweşiya penceşêrê hat çêkirin û wiha got: “Me ji sala 2023’an ve dest bi lêkolîna li ser nexweşên ku penceşêr bi wan re heye, kir. Sînorê lêkolîn û serjimariya kesên ku penceşêr bi wan re çêbûn ji Tebaxa 2023’an heya Tebaxa 2024’an hat çêkirin. Lêkolîna bi tevkariya Heyva Sor a Kurd, Komîteya Sînorê Sêmalka, lêkolîna bijîşk Kesar El-Elî, bijîşk Dilar Betal û Rîma Elsayx ew patrocîst in karê wan naskirina nexweşiya penceşêrê ye û bijîşkekî bi navê Alan Xelef e ku nexweşan derman dike,  hat amadekirin. Herwiha ev lêkolîn li Kongreya Mezopotamiya ya Tendursitiyê li Başûrê Kurdistanê di sala 2024’an de hat pêşkêşkirin, konferans jî bi beşdariya gelek bijîkên kurd li her çar parçeyên Kurdistanê salane tê lidarxistin. Me jî xwest ku bi riya vê kongreyê balê bikşînin li ser rêjeya nexweşiya penceşêrê li Rojavayê Kurdistanê.”

**‘Lêkolînê 7 hezar û 149 nexweşên penceşêrê li Rojava tomar kirin’**

Miheme eşekere kir ku li Rojavayê Kurdistanê 7  hezar û 149 kes bi dirêjahiya salekê bi nexweşiya penceşêrê ketin û wiha axivî: “Ev guhertinên ku li welatê me çêbû, bi zêdebûna hejmara jenetor û erebeyan, rûdana şer, xwarina nepaqij, qirêjbûna jîngeha herêmê û gelek sedemên din hişt ku rêjeya penceşêrê bilindtir bibe. Herwiha vexwarina çixareyan sedemek bingehîn e ku bi riya wê penceşêr bi mirov re çêdibe. Piştî lêkolîna ku hat çêkirin hat diyarkirin ku li Rojavayê Kurdistanê hejmar kesên ku nexweşiya penceşêrê bi wan re heye, 7 û 149 kes bûn.  Herwiha li tevahiya Sûriyê jî hejmara 21 hezar û 926 kesên nexweş bi dirêjahiya sala 2023-2024’an hat belgekirin. Bêguman hejmareke wiha ku li Rojava bi dirêjahiya salekê bê belgekirin pir bilind e, li gorî nexweşiya penceşêrê, kesên nexweş dikare heya 5 salan jî jiyana xwe berdewam bike, lê ji ber kêmpeydabûna dermanan, nexweşên li Sûriyê û Rojava jiyana xwe ji dest didin.”

**‘Rêjeya nexweşiya penceşêrê li cem jinan bilindtir bû’**

Ridwan anî ziman ku rêjeya nexweşiya penceşêrê li cem jinan bilindtir bû ji ya mêran û wiha domand: “Li gorî lêkolîna ku hat çêkirin rêjeya mirinê di 2023-2024’an de li Sûriyê ku bi nexweşiya penceşêrê mirin ji sedî, 64 bû, ango ji 5 nexweşan 2 kes û 3 kes jiyana xwe ji dest didan, li gorî rêjeya nexweşên cîhanê ev yek pir bilind e, ji ber ku li ser asta cîhanê ji 5 nexweşan 1 nexweş jiyana xwe ji dest dide. Li aliyekî din me di encama vê lêkolînê de dît ku hejmara nexweşên jin ên ku penceşêr bi wan re heye û têne dermankirin bilindtir e ji hejmara nexweşên mêr. Cihê mixabîniyê ye ku rêjeya jinan ji sedî 65 e û piraniya  curya nexweşiyê jî nexweşiya penceşêra pêsîrê ye, lewma jî ev yek dibe cihê tirs û rapirsînê.”

**‘Rêjeya penceşêrê li Rojava metirsiyê çêdike, divê nexweşxane bên avakirin’**

Bijîşkê nexweşiyên jinan Ridwan Mihemed da zanîn ku asta penceşêrê li Rojava pir bilind, lewma divê nexweşxaneyên ji bo dermankirina penceşêrê bên avakirin û wiha bi lêv kir: “Li ser asta Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevî du nexweşxaneyên penceşêrê tenê hene. Nexweşxaneyek a Heyva Sor a Kurd li Qamişlo ye û nexweşxaneyeke din a Rêveberiya Xweser li Reqayê ye. Li tu deverên din navend û nexweşxaneyên ji bo dermankirina penceşêrê tune ne, ev sedem dihêle ku nexweş herin Şamê û Başûrê Kurdistanê. Li Nex-



weşxaneya Girêkên Penceşêrê ya Heyva Sor a Kurd derman heye û nexweş bêpere tên dermankirin, her xizmetek hebe Heyva Sor ji bo nexweşan pêşkêş dike û da ku nexweş bên dermankirin xebateke baş dide meşandin. Lê li Heyva Sor a Kurd gelek derman kêm in, nexweş neçar dibin ku dermanan ji derve bînin, buhayê dermanên penceşêrê pir bilind e, ne derman û ne alavên tendurstiyê li vir peyde nabin. Lewma jî banga me ew e ku nexweşxane û navendên taybet ji bo nexweşiya penceşêrê bi hemû cureyên xwe bên avakirin û divê Rêveberiya Xweser destkê bide vê gavê.”

# Ji bo fêrkirina destwerdana lezgîn.. kursên bê dirav


Jîn Hisên/Qamişlo

**Di çarçoveya hewcdariya kadroyên tenduristiyê ji bo pêşkêşkirina destwerdana lezgîn, Desteya Tenduristiyê hewil dide bi rêya kursên bê derav ji ciwanan re vê valahiyê dagire û pergala tenduristiyê li herêmê xurtir bike.**

Dewreyên hemşîretiyê derefteke girînge ji bo fêrkirina destwerdana lezgîn, da ku ciwan karibin lênhirînên bijîşkî yên bingehîn di rewşên awarte de pêşkêş bikin. Beşdarbûna zêde di van kursan de hişyariya civakê nîşan dide, bi taybet di çarçoveya hewcdariya kadroyên ku karibin alîkariya acil pêşkêş bikin.

Derbarê vê mijarê de endamên desteya tenduristiyê ku dewreyên hemşîretiyê rêxistin dikin  Samiya Yûsif û Mehmûd Seyîd  ji Rojnameya me re axivîn.

Samiya Yûsif di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Bi armanca fêrkirina ciwanan ji destwerdana lezgîn û hemşîretiyê re Kursa fêrkirin û perwerdeyê tê dayîn, ev kurs ji hêla Mehmûd Seyid ve tê dayîn, heta niha 8 kursên perwerdeyê hatin vekirin, li



Samiya Yûsif



Mehmûd Seyid

ser çend komînên li bajarê Qamişlo hate dabeşkirin.”

Samiya Yûsif wiha domand: “Komînên ku kurs lê hatin dayîn wiha ne: Komîna şehîd Hebûn du dewre bûn ya yekemîn 32 kes harzir bûn ya din jî 28 kes tevlî bûn.  Komîna Um El-Firsan du dewre hatin dayîn, ya  yekê 35 kes girêdayî Yekîtiya Ciwanên şoreşger bû, ya din 29 kes tevlî bûn. Komîna şehîd Orhan dewre hatin vekirin, ya yekê 25 û ya din 18 kes tevlî bûn. Komîna şehîd Adil dewreyek hate vekirin tê de 20 kesan cihê xwe girtin).”

Samiya Yûsif tekez kir ku hejmara kesên ji komînan derçûn gihaşt 76 kesan, ev yek serkeftina vê inyatîfê di amadekirina kadroyên bijîşkî nîşan dide.

Samiya Yûsif diyar kir ku dewreya mehekê berdewam dike ûwiha got: “Piştî dewreya mehekê bawername tê dayîn û ji hêla navçeyê bi awayekî fermî tê îmze kirin. Em hewil didin ku şahiyan piştî bidawîbûna her dewreyekê çêbikin ji bo spasiya hewildanên kesên ku tevlî dewreyên bûne bikin, herwiha da ku wan taşwîq bikin ji bo domandina xebatên xwe.”

**Giringiya hebûna kesên zane di destwerdana lezgîn de**

Samiya Yûsif wiha got: “Di her komînekê 3 xwendekarên serkeftî tên hilbijartin, da ku derbasî dewreyeke taybet ku sê mehan dewam dike, bibin. Perwedeyeke berfreh û pêşketî ji bo van xwendekaran tê dayîn weke bikaranîna makîneya ECG û makîneya Îko, wekî din fêrkirina drûna birînan û destwerdana lezgîn, ji bo berdewamkirina xwendinê ew tên şandin zanîngeha Rojava, piştî qedandina xwendinê bawernameyeke femî ku ji aliyê navdewletî tê nas kirin didin wan, da ku li pêşiya wan asoyên berfireh di warê tenduristiyê de bê vekirin.”

Samiya Yûsif wiha gotina xwe qedand: “Ji bo pêşkêşkirina mîna van dewreyan xebata me berdewam e, ji ber giringiya hebûna paramedîkên perwerdekirî di her taxekê de, armanca me ku her ciheke kadroyên ku karibin destwerdana lezgîn bikin di rewşên awarte hebin. Ev insyatîf dê berdewam be bi awayekî pêşketî.”

**Berfirehkirina qada perwerdeyê**

Endamê Desteya Tenduristiyê û mamosteyê dewreyên hemşertiyê Mehmûd Seyîd wiha got: “Bi derbasbûna demê re ev insyatîf hate pêşxistin, bû sedemek ku ez bi awayekî serbixwe van dewreyan di her taxekê de bidim weke: Taxa Hilêliyê, Kornîş û taxa Um El-Firsan. Di sê mehan de 8 dewre li komînan hatin dayîn, armanc jê perwerdekirina hejmareke mezin ji ciwanan da ku karibin destwerdana lezgîn di rewşên awarte de pêşkêş bikin. Ji kesên bi temenê cuda tevlî bûn, ji temenê 20 heta 40 salî ev yek hişyariya civakî bi giringiya hebûna kadroyên karibin destwerdana lezgîn pêşkêş bikin; nîşan dide.

Mehmûd Seyid wiha domand: “Hin zehmetî hene riya xebata me asteng dike weke ne peydakirina wesîleyên veghustinê di nava komîn û taxan de, wekî din kêmbûna hin madeyên fêrkirinê, xwendekar ji hêla xwe tiştê kêm dikrin, lê ji ber ku perwerde bê dirave divê hemû pêwistî ji bo dewreyên perwerdeyê hazir bin.”

Mehmûd Seyîd destnîşan kir ku hin pilan hene ku dewreyên nû piştî cejnê bên vekirin  û wiha gotina xwe bi dawî kir: “Tevî zehmetiyên ku li pêşiya me derdikeve, em ê dewreyên hemşîretiyê berdewam bikin, ji ber ku pir giringiya wê di xizmeta civakê de heye. Armanca me ku di her taxekê de paramedîkên perwerdekirî ji bo destwerdana lezgîn hebin di rewşên awarte de.”



# ‘Tirkiyê li hember projeyên çareseriyê di Sûriyê de dibe asteng’

Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk Reşîd Ehmed da zanîn ku Tirkiyê li hember projeyên çareseriyê di Sûriyê de dibe asteng û got: “Heta çareserî di Sûriyê de pêkan be, pêwîst e destwerdana Tirkiyê bi dawî bibe û lihevkirinên hêzên navxweyî pêş bikevin”.

Esma Mistefa/Qamişlo

Bi guharînên bingehîn ên ku di giştî Sûriyê de hatine çêkirin, rewş bi tevahî derbasî qonaxeke nû bû. Lê belê destwerdanên Tirkiyê û astengiyên ku li pêşiya çareseriya aloziya Sûriyê derdixîne, nehatine rawestandin.

Girêdayî vê mijarê Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Reşîd Ehmed bersiva pirsên rojnameya me dan.

**Piştî hatina HTŞ’ê li ser desthilatdariya Sûriyê û guhartinên pêk hatin jî, Tirkiyê hê jî axa Sûriyê dagir dike, her wiha daxwazên avakirina bargehên leşkerî û xebatên istixbaratî hê berdewam in. Gelo siyasetekî çawa tê meşandin?**

Di sedsaliya derbasbûyî de gelek lihevkirinên li ser Rojhilata Navîn pêş ketin, da ku çawa Rojhilata Navîn bikin navenda pevçûn û qeyranan, peymanên herî balkêş jî peymana Sayks bîko 1916’an û a Lozanê 1923’an. Her du peyman di dîzayînkirina Rojhilata Navîn de cihê gerî girîng lîstin. Îro di 2025’an de ku tam sed sal li ser vê peymanê re derbas dibe ev hevpeyman temam dibin û Rojhilata Navîn anîn rewşa wê ya heyî. Herwiha guhartinên ku niha piştî 13 salan li ser aloziya Sûriyê re derbas dibe çêbûne û hatina HTŞ’ê; encama van siyasetan e. Li ser vê esasî  HTŞ’ê ne ji xwe berê weke tiştekî ji rêzê hate ser serweriya Şamê. dibe ku gelek hêzan jî lîstok û xepandinên mezin jî çêkirin. Mînak Rûsiye dewletekî gerentor e di Sûriyê de û bi Emerîka re di nava têkiliyan de ne û di cvîna ku li Urdinê di 2019’an de di navbera Emerîka, Rûsiya û Îsrayîlê de, li wir nexçeya Sûriyê û a Rojhilata Navîn hat xêzkirin.

Dema gihîştina HTŞ’ê ser serweriyê, êdî Sûriyê bû navenda lihevkirinanên nû. Li hember kiryar û rewşa ku di Sûriyê de dihate jiyankirin her wiha guhartinên ku hatine kirin; tu dewletên Sûriyê bertek nîşan nedan. Helbet wê Tirkiyê bargehên xwe yên leşkerî û xebatên xwe yên istixbaratî pêk bîne. Ji ber tu dewlet li hember Tiriyê bertek nîşan neda ji bilî Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

Tişta ku niha di Sûriyê de diqewime, xebatekî îstixbaratî di asta herî jor de ye, her wiha rêveberiya nû lawaz e, rêveberiya Xweser û pirojeya wê a çareseriyê di gelek aliyan de şer dike yek hebûna xeteriya DAÎŞ’ê re rûbirû ye, di aliyê din de pirisgirêkên aborî a ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve derdikevin. Rûxmî her tiştî jî Bakur û Rojhilatê Sûriyê karî ji giştî Sûriyê re pirojeya çareseriyê pêşkêş bike û herêmên xwe biparêz e.

**Bi hemdemiya rêkeftinên ji bo vegera bi ewle a koçberan, Tikriyê li pêşiya vê yekê dibe asteng. armanc ji vê yekê çiye û hûn rewşa heyî a Tirkiyê çawa dinirxînin?**

Tirkiyê li pêşiya pêşketin û çareserkirina aloziya Sûriyê bûye asteng. Bi taybet Rêveberiya Xweser li pêşiya çavên hêzên herêmî û navnetewî karî ev yek îsbatbikira. Dewlet û hêzên navnetewî jî di wê zanebûnê de ku tirkiyê di dirêjkirina alozî, pevçûn û şerê di soûriyê de dibe destek.

Di guhartin û pêşveçûnên ku demên dzawiyê de hatine pêşketin de jî, ji raye giştî re hat xuyakirin ku Rêveberiya Xweser û hikumeta nû dikare di gelek aliyan de bigihînin hev ûû bibin hêza çareseriyê. Bi tayebt hevpeymanên ku di dawiyê de hatine pêkanîn ev yek îsbat kir û li pêşiya gelek leystûkan girt. Ji gavên destpêkê jî da ku em li pêşiya siyaseta înkar û qirkirinê û guhartina demografîk bgrin, ew jî vegerandina bi ewle a koçberan li herêmên xwe. Ku em dixwazin Sûriyê êdî vegera rewşa xwe a normal.

Lê belê li hember vê yekê jî Tirkiyê bi her rengî dibe asteng. Tirkiyê niha aloziyên cidî ên aborî, civakî, siyasî, leşkerî jiyan dike, her wiha nerazîbûnên ku di hundir hikumetê de derdikevin pêş. di aliyê din gelek pilan di navbera Tirkiyê û welatên mîna Îran û Îsrayîlê de hene ku muhtemele ku bigihînin asta pevçûnê. Çawa ku Îsrayîl gelek cih û bargehên di Sûriyê de hedefgirtin, ev yek jî teqez dike ku êdî siyaseta Tirkiyê di Sûriyê de nayê qebûlkirin. ji ber wê jî êdî Tirkiyê ber bi dawîbûnê ve diçe, ji lewra wî hemû hewildanên xwe bike ku nefetise. Ziyareta herî dawî a Hekan Fîdan ji E,erîkayê re eşkere jê re gotin biçin û biaqil rûnin destê xwe ji Sûriyê berdin. Her çiqas ev yek hatibe veşartin jî lê ya rast ev bû.

**Ji bo çareserkirina pirsgirêkên heyî ên di Sûriyê de her wiha da ku Sûriye bigihîne rewşeke îstîqrarê. dive pirûje û gavên çawa di nava hêzên di Sûriyê de bêne avêtin?**

Ji vir û pê ve da ku em bigihînin çareseriyekî bingehî ji bo hemû gelên Sûriyê û pêşeroja wê divê gavên aştî û lihevkirinê di hundir Sûriyê de bêne avêtin. Ev bar jî hêzên QSD- MSD rakirine ser xwe û ji hemû lihevkirinan re vekirî ne.



Ger lihevkirin û pirojeyekî çareseriyê guncav neyê pêşxistin; ne gengeze ku birînên Sûriyê bêne pêçandin. Divê di vî alî de rola hêz û dewletên navnetewî derkeve da ku çareseriyeke navxweyî di nava aliyên di Sûriyê de bê pêşxistin. Her çiqas di aliyê îdeolojîk û cewher de Rêveberiya Xweser û hikumeta nû ji hev dur bin jî, lê ger me karî em bi hev re li ser masê rûnin û bi hev re hin çaresiyan pêş bixînin, ev tê wateya ku di pêşeroja Sûriyê de her du jî dikarin gavên firehtir ji bo hemû gelên Sûriyê bavêjin. Gelê Sûriyê hêjayî jiyaneke aram û aşîtyane ye ji lewra wê armanca me jî peydakirina çareseriyê be.

Gelê Kurd bi pirojeya xwe a aştî û demokrasiyê di guhartina dengeyên sedsaliya pêşberî Rojhilata Navîn de xwedî rolin. Ji ber gelê Kurd di sedsala nû de êdî siyasetên durketin, tunekirin û qirkirinê qebûl nakin.

# ‘Hevpeymana Civakî dikare bibe bingehek ji bo destûra Sûriyê’

Navenda Nûçeyan

**Lêkolîner Lezgîn Ibrahîm tekez kir ku li şûna Reşnivîsa Destûrî, Hevpeymana Civakî dikare bibe bingehek ji bo destûra nû ya Sûriyê û got, “Divê gelên Sûriyê li hev bicivin da ku sîstemeke hevbeş û demokras ava bikin û mafê bi dest bixin.”**

Hevpeymana Civakî li ser bingeha dadmendî, wekhevî, demmokrasî û çareserkirina krîza Sûriyê di 12’ê Berfanbara 2023’an de ji aliyê Rêveberiya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve bi hevpeyman ji 134 madeyên girîng hat sazkirin. Ev hevpeyman bû hêviyek ji bo gelên Sûriyê, lê bi ruxandina rêjma Beesê û hatin desthilata Şamê ya nû, hem jî derketina Reşnivîsa Destûra Sûriyê di 13’ê Adarê de hêviyên gelên Sûriyê ji bo demokrasiyê pûç kirin.

Têkildarî Reşnivîsa Destûrî û Hevpeymana Civakî, lêkolîner û endamê Navenda Firatê ya Lêkolînan Lezgîn Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.



**‘Reşnivîsa Destûra Sûriyê wê aramî û demokrasiyê çêneke’**

Lezgîn Ibrahîm da zanîn ku Destûra Sûriyê ya nû wê tu caran aramiyê û demokrasiy ji gelên Sûriyê re neafirîne û wiha got: “Reşnivîsa Destûr a Sûriyê bi şêwazê xwe yekreng e, aliyek tenê li nerîn, hişmendî û berjewendiyên xwe saz kiriye, hem jî kongireya niştîmanî jî bi vî rengî hat lidarxistin. Ew kongre mîna destûra Sûriyê bû ku nûnertiya gel, ol, bawerî, rêxistin û partiyên siyasî yên Sûriyê nekir û ew  venehewandin. Bi vî şêweyî hat xuyakirin ku armanc ji destûreke wiha ew e ku li şûna desthilata rêjîma Baas, desthilateke din were, ne ku desthilata Şamê hilweşîne, lê belê zivirandina desthilatdariyê ye. Bi riya destûra Sûriyê ya nû dîse hertişt dikeve destê kesayetekî tenê. Em dikarin bibêjin ku ev destûr ji ya rêjîma têkçûyî jî xirabtir e, ji ber ku bingeha destûr, hem jî saziyên ku di encama wê de bên avakirin, li aliyekî din jî zagonên ku bên sazkirin, li gorî Ola Islamê ne. Lewma jî destûreke wiha dihêle ku pêkhateyên Sûriyê ji mafê xwe bên dûrxistin, hem jî ol û baweriyên Sûriyê bên paşguhkirin. Ji ber vê yekê jî bertekên gelên Sûriyê geş bûn, sedem ew e ku gelên Sûriyê baş dizanin ku Reşnivîsa Destûrê wê tu caran aramî û demokrasiyê çêneke di nava civakê de.”

**‘Hevpeymana Civakî dikare bibe bingehek ji bo destûra Sûriyê’**

Ibrahîm tekez kir ku Hevpeymana Civakî dikare bibe bingehek ji bo destûra nû ya Sûriyê û wiha axivî: “Bi dirêjahiya krîza Sûriyê şer û pevçûn rûdida, ji destpêka wê ve rewş hestiyar bû, lê weke herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê devereke tekane bû ku şerê navxweyî çênebû. Di şertûmercên zor de û li gorî pirrengiya pêkhate û olan, heya roja îro herêma Rêveberiya Xweser li ser asta Sûriyê devera herî aram e. Herwiha hemû pêkhate bi ol, bawerî û tevgerên xwe ve bi hev re di nava Rêveberiya Xweser de cihê xwe girtine. Ev ewlehî, aramî û wekhevî tev jî bi saya sîstema Rêveberiya Xweser û felsefeya Neteweya Demokratîk e, vê sedemê nehişt ku şerê navxweyî çênebe. Li hêleke din sazkirina Hevpeymana Civakî û şêwazê wê yê ku ev çend sal in ketiye warê piratîkî, tekez kir ku ev hevpeyman bibe bingehek ji bo destûra nû ya Sûriyê. Lewma jî eger Hevpeymana Civakî were nîqaşkirin, dikare cihê şûna destûra nû bigire.”

**‘Hevpeymana Civakî li gorî daxwazên navnetwî ye’**

Endamê Navenda Firatê ya Lêkolînan Lezgîn Ibrahîm destnîşan kir ku şertûmercên navnetewî ji bo Sûriya hevbeş bi Hevpeymana Civakî pêk tê û wiha bi lêv kir: “Tişta ku ji hemû gelên Sûriyê tê xwetin ew e  ku li hev bicivin û bibin yek, herwiha li bhemberî Reşnivsa Destûrî ya Sûriyê bertekên xwe nîşan bidin û bi tu awayan destûrekî ji bo siberoja Sûriyê qebûl nekin. Sîstema Hevpeymana civakî li gor daxwazên navnetwî ye, gelek dewlet ji desthilata Şamê dixwazin ku hemû gelên Sûriyê cihê xwe di nava destûra Sûriyê de bigirin, di heman demê de sîstemeke hevbeş û demokratîk bê avakirin ku dûrî sîstema rêjîma Bees be. Em dibînin ku daxwazên dewletên navnetwî bi Reşnivsa Destûrî pêk nayên, lê bi sîstema Hevpeymana Civakî tên pêkanîn, helbet  Hevpeymana Civakî demokrasiyê digre nava xwe û mafê pêkhateyan tê parastin. Dema ku reşnivîs derket bertekên baş li dijî wê derketin, dewletên cîhanê jî rewşa Sûriyê ji nêz ve dişopîne, rger bibînin nerazîbûn li hemberî desthilata Şamê ji hêla pêkhateyên Sûryê ve çê bibe, wê piştgiryê bidin gelên Sûriyê ku bikarbin ber bi Sûriyeke nû ve biçin û pê re jî hemû gelên Sûriyê mafê xwe bi dest bixin.”

# Banga dîrokî ya Rêber Apo

**Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê yê bajarê Dêrikê Mihemed Ebdulrehman diyar kir ku 27'ê Sibatê rojeke dîrokî bû, mohra xwe li dîroka cîhanê xist. Banga Rêber Apo ne tenê di dîroka Kurdistanê de, lê di dîroka tevahiya herêmê de rûpeleke nû dest pê kir. Ji ber ku di rêbaz, paradîgma û felsefeya têkoşînê de guhertin çêbû.**

**Ayşa Silêman/Dêrik**

Rêber Ebdullah Ocelan di 27'ê Sibata 2025'an de banga aşitî û civaka demokratîk kir. Ev bang xwedî roleke girîn bû û gelê kurd ev yek girt ser milê xwe. Lê dagirkeriya Tirk heya niha tu gav ber bi aşitiyê ve ne avêtiya û heta niha jî hîn tecrîd li ser Rêber Apo berdewame û ji mafê Hêviyê bê par e.

Di derbarê banga Rêber Apo û negavavêtina Dewleta Tirk li hemberî vê bangê, Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê yê bajarê Dêrikê Mihemed Ebdulrehman ji Rojnameya me re axivî.

**Coş û kelecana gel ji bo bangê**

Mihemed Ebdulrehman da zanîn ku bandora banga Rêber Apo ne tenê li ser herêmê kir lê li tevahî cîhanê kir û wiha got: "Rêber



Apo di dîrokê de rûpelekî nû vekir. Bêguman hêzên hegemonîk û mêtînger wê bixwazin vê yekê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin. Lê belê hêzên dilxwazên azadiyê jî wê bixwazin vê derfetê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin û armancên xwe bi ser bixînin. Bi vê bangê re pêşî li têkoşîna demokratîk vebûye. Banga Rêber Apo gelek Zehmete ku em şîrove bikin, lê dema biryar hat ku wê Rêber Apo peyamê bide, her kes ma li benda vê peyamê, ne tenê li heremê, li tevahî Rojhilata Navîn û cîhanê li benda vê peyamê bûn û peyama Rêber Apo coş û kelecaneke mezin li cem gel ava kir. Milet



gelek kêfxweş bû û bi taybet gelê Rojavayê Kurdistanê ev peyam ji bo xwe gelek girîng dît, ji ber ku ji destpêka Şoreşa Rojava ve em li ser fikir û felsefeya Rêber Apo mezin bûne û ger ne bi saya fikir û remanê Rêber Apo ba em nedigihiştin vê astê. piştî vê bangê coşa gel bilind û xurtir bû, ji roja peyamê heya Roja Îro hemû roj bûne rojên coş, kêf û şahiyê, bi vê coşê 8'ê Adarê, 21'ê Adarê û 4'ê Nîsanê hate pîroz kirin."

**'Hêviya me Kurdistanek azad û serbixwe ye'**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê ya bajarê Dêrikê Mihemed Ebdulrehman dawî li axaftinên xwe anîn û wiha got:" Dagirkeriyê heta niha tu gav ne avêtine û navêjê jî û baweriya me bi dewleta Tirk nayê, ji ber ku heya niha êrişên wê li ser Qadên berxwedanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin. Dema Rêber Apo ev peyam da yekser PKK'ê bersiv da banga wî û pêkanî, lê dewleta tirk ji nû ve şerê xwe gurtir kir. Di demên pêş de heya ku banga Rêber Apo baş cihê xwe bigre pêwîste em yekîtiya gelê kurd xurttir bikin û xwe bi rêxistin bikin. Piştgiriya hêzên xwe bikin û di milê diplomasî de xwe xurt bikin. Di heman demê de em bi coş, kelecan û bawerî tev bigerin. Hêviya me ji bo tevahî gelên Rojhilata Navîn ew e ku destek bidin gelê kurd, gelê ku bi hezarên salan di bin qirkirin û işkenceyê re derbas bûye û mafê wî hatiye xwarin. Di heman demê de hêviya me ew e ku em gavekî bavêjin bi alîkariya hemû gelên Rojhilata Navîn da ku em bikaribin Kurdistanek serbixwe û azad.

# Hêvî Mustefa: Yekîrêzî pêk neyê wê kurd Lozaneke din bijîn

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Cîgira Hevserokatiya Kongra Neteweyî ya Kurdistanê Hêvî Mustefa diyar kir ku ji bo avakirina yekîtiya kurdî niha derfeteke dîrokî di destê kurdan de heye û wiha got: "Em amadekariyên konferansa netewî dikin û hewl didin her kes cihê xwe di konferansê de bigre. Eger yekîtiya kurdî pêk neyê em ê Lozaneke nû bijîn."**

Derbarê lidarixstina Konferansa Partiyên Kurdî ji bo avakirina yekîtiya kurdî, Cîgira Hevserokatiya Kongra Neteweyî ya Kurdistanê Hêvî Mustefa bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Amadekariyên ji bo lidarixstina Konfransa kurdî gihane çi astê?**

Berî demekê di sedsaliya Lozanê de KNK'ê civînek li Lozanê lidar xist, weke konferansekî çê kir. Di wê civînê de biryar hate birin ku her parçeyek ji Kurdistanê kongrekî yan civînekî şêwra netewî lidar bixîne. Li ser vê bingehê me jî weke KNK'ê komîteyek amadekar



kir, ji bo civîna şêwra netewî. Di wê komîteyê de partiyên ku di hundir KNK'ê de û me hewl da ku rêxistinên civaka sivîl, rêxistinên jin, ciwan, Saziya Malbatê Şehîdan, kesayetên serbixwe, rêxistinên oldaran û mezheman ên Êzîdî û Îsalamî, di nava vê komîteyê de cih bigrin, li ser vê bingehê me jî dest bi kar û xebata ku em rengê vê şêwra netewî çê bikin, kir. Lê hîna em di amadekariyê de bûn, rêjîma Baasê hate hilweşandin, guhertinên siyasî li ser asta Sûriyê û herêmê çê bûn. Ji bo wê gelek insyastîf ji bo yekrêziya kurdî lidar ketin. Lewra me got em wek komîta amadekar hemû insyatîvên bikin yek û bikin "Konferansa Kurdên Rojava" bi vî awayî roj bi roj komîta amadekar berfiretir bû, her kesî cihê xwe tê de girt, bi taybetî ez behsa partiyan dikim me hewl da ku tu partiyên siyasî li derveyî vê komîta amadekar nemîne, em gihiştin dawiyê lê ENKS'ê hîn bersiv nedabû, tevî ku me 2 caran komîta xwe ya têkilî û hevdîtinan ji wan re şand, lê bersiv nedan û negotin; erê yan na, ji bo wê me bilez nekir. Me got em şaştiyên dîrokî dûbare nekin, bela tu kurd li derveyî vê kongrê nemîne. Ji ber mandina kurdekî li derveyî lidarixistin konferansê kurdî tê wateya ku dijmin wê dîsa lîstokên xwe li ser me bidin meşandin û Lozaneke din bi serê me de were.

**Ji bo Konferansa partiyên kurdî astengiyên derketin çi bûn? Heta çi astê jî ev astengî hatin derbaskirin?**

ENKS'ê û PYD'ê bi hev re civiyan, li ser ragihandinê jî hevdîtina wan erênî bû, encamên baş ji wan hevdîtinan derketine. Niha jî em di amadekariya ku çawa konferansa xwe lidar bixin, weke komîta amadekar di destpêkê de me gotibû em ê kongrekî berfireh ku tê de tevahî partî beşadar bibin û ji sedî 50 an 40 kesayetên serbixwe derveyî partiyan vexwînin vî kongrî. Ji ber biryara gelê kurd ne ku mafê partiyan tinê ye, lê pêwîst e her kes ji civakê beşdar bibe, nûnerên civakê hemû tê de hebin. Hinekî di vê xalê de hevpeyaman niha nehate meşandin, lê hêviyên me mezin in ku ew jî derbas bibe û di demeke nêz de em ê yekrîziya kurdî raghînin.

**Ji bo siberoja Sûriyê girîngiya yekrêziya kurdî çi ye?**

Niha em dibînin rewşa Sûriyê çi ye, rewşa Sûriyê piştî hilweşandina rêjîma Baasê de guhertinên siyasî yên cidî hene ku em weke



kurd ne di vê danûstendinê de bin, parçe parçe herin û wê Lozaneke din bi serê me de were. Wê demê em ê destkeftiyên Şoreşa Rojava winda bikin. Herwiha ne tenê destkeftiyên Şoreşa Rojava destkeftiyên Kurdistanî tevahî em ê winda bikin. Derfeteke dîrokî bi dest me ketiye û li kêlek wê metirsiyekî gelekî mezin jî li ser me heye. Gelek girîn e ku em bi yek şandekî, bi yek nerîn û helwestî herin giftûgoyan û daxwaza mafê kurd bikin. Piştî em mafê kurd di destûra Sûriya pêşeroşê de misoger bikin, em karin nakokiyên me yê partitî di navberî xwe de çareser bikin. Heger em nebin yek wê dijmin me ji hevdû bidize û têkoşîna me winda bike.



# 'Azadiya Rêber Apo azadiya gerdûnê ye'

**Welatiyên bajarê Qamişlo anîn ziman ku azadiya fîzîkî a Rêber Apo azadiya tevahî mirovahiyê ye û wiha gotin: "Heta ku Rêber Apo azad nebe, wê tu çareserî di Rojhilata Navîn de çênebe."**

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Bi salên dûr û dirêj Rêber Apo li girava îmraliyê bi pergala îşkence û qirkirinê rû bi rû ye. Tevî ku di çarçoveya meşandina pêvajoya Aşitî û Demokrasiyê de Rêberê Gelan Abdullah Ocalan di 27'ê Sibatê de bangeke dîrokî kir. Lê dewleta Tirk a dagirker tu gavên berbiçav navêtin û tecrîd an pergala îşkence û qirkirinê li hember Rêber Apo û gelê kurd berdewam dike.

Derbarê pergala tecrîd û îşkence ku li ser Rêber Apo tê meşandin welatiyên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.

**'Em ê têkoşîn bikin heta Banga aşitiyê bikin pratîkî'**

Welatiya bi navê Cewahir Osman da zanîn ku tevî Rêber Apo banga aşitiyê kir lê hîn tecrîda ku li ser tê kirin ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve berdewame û wiha got: "Ji bo bangewaziya Rêber Apo a aşitiyê, dewleta Tirk hîn tu



**cewahir osman**

gavên cidî navêtine û tecrîda li ser Rêberê gelê kurd Abdulah Ocelan berdewame. Ew hukmê hêviyê yê ku gereke Rêber Apo bigire ji bo ku fîzîkî azad bibe, ew jî hîna tu biryar ji bona wê nedane, herwiha xwe bê agahî dikin û dewleta Tirk hîn jî dixwaze ku dijitiya di navbera Kurd û Tirkan de berdewam bike. Ji bo ev tecrîda li ser Rêber Apo tê kirin me soza xwe daye ji berê de û heta niha ku em ê heta dawiyê xeta Rêbertî biparêzin û xeta aşitî û demokratiyê jî biparêzin, herwiha têkoşînê bikin heta ku banga aşitiyê bikin pratîkî li ser rûyê erdê ji bo Rojhilata Navîn û ji bo giştî cîhanê û azadiy Rêbertî bibînin."



**dilbirîn ferho**

**'Dewleta Tirk aştiyê red dike'**

Welatiyê bi navê Dilbirîn Ferho jî anî ziman ku Rêber Apo banga aşitiyê dike lê dewleta Tirk hîn jî aştiyê qebûl nake û wiha anî ser ziman: "Tecrîda dewleta Tirk a dagirker li ser Rêber Apo berdewame û ev dibe sedema nerazîbûna gelê kurd, ji ber dewleta Tirk dagirkirina xwe li ser kurdan berdewam dike û aşitiyê pêk nayine. Dewleta Tirk israra tunebûna kurdan dike, lê heta dawiyê wek gel piştgiriya Rêber Apo dikin û hêvî dikin ku serkeftin ya me ye ji ber em xwedî heqin û hêviya me ew e ku dawiya diktatoriya Tirk bê."



**hecî ferhan**

**'Daxwaza gelê kurd aştî ye'**

Welatiyê bi navê Hecî Ferhan diyar kir ku fikir û felsefeya gelê kurd a aşitiyê ye û wiha got: "Em ê heta dawiyê piştgiriya banga rêbertî bikin. Em dibînin ku dewleta Tirk piştî banga Rêber Apo îçkence û tecrîd zêde kiriye, herwiha êrişên xwe li ser çiyayên azad zêde kiriye û li ser pira Qeroqozaxê jî hîna êrişên li ser berdewame. Tiştekî girêdayî aşitiyê li dora dewleta Tirk xuya nake em dibînin her û her êrişên xwe li kurdan zêde dike. Em ê hertim li ser piyabin heta ku rêberê xwe fîzîkî azad bikin."

# Ji bo parastina rojnamevanan yekîneya taybet hate avakirin

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Rêveberê Yekîneya Şêwermendiya Ewlehî û Parastina Rojnamevanan Ehmed Mihemed wiha got: "Ji ber şert û mercên zehmet ê ku rojnamevan tê de derbas dibin, Raghandina Azad Yekîneya Parastina Rojnamevanan ava kir. Herwiha em ê ji bo piştgiriya tevahî rojnamevanên li ser xaka Sûriyê xebat dikin, kar bikin."**

Bi armanca parastin û piştgiriya rojnamevanan, di 13'ê Meha Adara 2025'an de Yekîneya Şêwermendiya Ewlehî û Parastina Rojnamevanan ji hêla Raghandin Azad ve hate raghandin.

**'Ji bo piştgriya rojnamevanan yekîne hate avakirin'**

Girêdayî vê mijarê Rêvebrê Yekîneya Şêwermendiya Ewlehî û Parastina Rojnamevanan Ehmed Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Ehmed Mihemed diyar kir ku ji ber şert û mercên ku rojnamevan tê de derbas dibin, Ragihandina Azad pêwistî dît ku Yekîneya Parastina Rojnamevanan bê avakirin û wiha berdewam kir: "Di encama rewşa şerê ku Sûriyê tê de derbas dibe, rojnamevan rastî gelek metirsî û xeteriyan tên. Nexasim piştî rûxandina rêjîma Baasê û hatina HTŞ'ê li dest-



hilata nû gelek gef li ser rojnamevanan têne kirin. Rojnamevanên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwazin xwe bighînin herêmên dîtir yên Sûriyê, lê metirsî li ser jiyana wan heye, nemaze di dema dawî de ji ber êrişên dewleta Tirk du hevalên me yên rojnamevan di dema şopandina şer de jiyan xwe ji dest dan, ji ber vê yekê pêwîst bû ku Yekîneya Parastina Rojnamevanan bê avakirin da ku piştgiriyê ji tevahiya rojnamevanan re pêşkêş bikin."

**'Tevahî xebatkarên raghandina azad cihê xwe tê de digrin'**

Ehmed Mihemed wiha pê de çû: "Hejmara endamên girêdayî yekîneyê ne diyar e, hemû endam û xebatkarên Raghandina Azad cihê xwe di nav de digrin. Her rojnamevanek rastî metirsî û xeteriyê bê di riya vê yekîniyê kare xwe bighîne endamên dîtir ên Raghandina Azad da ku pirsgirêka xwe bîne ziman û çareserî bê kirin. Bi giştî endamên Raghandina Azad û rojnamevên dîtir di herêmên Sûriyê yên din yên karê rojnamevantiyê didin meşandin karin xwe weke endamên yekîniyê bibînin."

Ehmed Mihemed destnîşan kir ku yekîne bi hevkariya şêwirmendê ewlekarî yê Misrê Ehmed El-Amîd, pisporê birêvebirina metirsiyan, (Yekîneya Şêwira Ewlekariyê û Parastina ji metirsiyan) hate avakirin.

**Aliyê qanûnî**

Ehmed Mihemed wiha berdewam kir: "Raghandina Azad beşa qanûnî di riya dadgeh, saziyên fermî yên Rêverberiya Xweser û deshilata Şamê re têkiliyan dike, da ku gef, doz, daxwazên rojnamevanan û metirsiya li ser jiyana wan pêk tê bidawî bikin û bi her awayî bên parasitin."

**Kar û xebat**

Ehmed Mihemed derbarê kar û xebatên yekîneyê wiha anî ziman: "Weke rêveberî li her parêzgeheke Sûriyê rojnamevaneke cihê xwe di nava rêvebriyê digre. Di nava 24 saetan de têkiliyên me berdewam in, rojane bi rêveberên herêman tê kirin da ku nas bikin çi li wan deveran diqewime, tekmîlên rojane, heftane û civînên mehane têne çêkirin. Li kêleka kar û barên yekîneyê di parastina rojnamevanan, perwerde û semîner di riya hineke belgeseran bi rojnamevanan re di dema pêş de wê bên li dar xistin, weke hişyarkirina ku çawa di qada şer de liv û tevgerê bikin, çawa karibin xwe biparêzin, têkiliyên xwe bikin da ku bighêjin qada şer û alîkariyê ji aliyê peywendîdar bixwazin. Wekî kar û xebatên dîtir ku hatiye meşand em têkilî bi saziyên desthilata Şamê re berfireh dikin ku çawa rojnamevanan bi giştî di hundirê Sûriyê de biparêzin."

**Çawaniya xwe gihandina yekîneyê**

Ji bo peydakirina rêgezên ragihandinê yên ewledar ên ku şopandin û rênîşandan tê de têne peyda kirin, bi riya e-nameya yekîneyê (yra.ypr.s@gmail.com), tîma yekîneyê bersivê dide.

Yekîne herwiha pêwendiya acîl bi rêya telefonê li ser (+963 934372067) peyda dike, ku ji bo rewşên awarte yên ku tê de hewcedariya rojnamevanan bi alîkariya bilez heye, dema ku rojnamevan rastî birîndarbûn, dorpêçkirin, gefa rasterast a kuştinê, armancgirtin, an hewildanên kuştinê tên, li gorî derfetan riya parastinê ji wan re peyda dike. Tê de tedbîrên bilez ji bo misogerkirina derxistina rojnamevan û xebatkarên saziyên ragihandinê ji xeleka armancgirtin û metirsiyê."

## FENER



### Banga Aşîtî û Civaka Demokratîk Tekane Altirnatîfa Gelan E

**Idrîs Henan**

Piştî hilweşîna rejîma Baas li Sûriyê, welat veguherî qadeke pêşbaziyê û aloziya di navbera Tirkiyê û Îsraîlê de jî mezintir bû ku her aliyek li pey berfirehkirina qada hegemoniya xwe de ye. Dewleta Îsraîl destwerdana Tirkiyê ya siyasî, leşkerî û aborî weke metirsiyekê li ser ewlehiya xwe dibîne û bi wê baweriyê êrişên ser hinek deverên Sûriyê wekî êrişên li dijî zêdegaviyên Tirkiyê nîşan dike. Ji aliyê xwe ve, Tirkiyê jî hewl dide bi rêya alîgir û çeteyên xwe yên di sazûmaniya desthilata Sûriyê bi cih kirine de, hegemoniya xwe tekûztir bike.

Diyare geşedan û veguherînên siyasî, aborî û çandî li Rojhilata Navîn, dê bandorê li teşeya sîstema herêmî û ya global ê sedsala derbasbûyî bike ku ketina rejîma Baas weke xaleke zîvronek ji bo çarenûsa jiyana gelan û dewletên herêmê hate hesibandin. Destpotiya hegemon a sîstema dewlet netew minewreyên stratejîk pêk tîne û bi hemû hêza destwerdanê hewl dide rê li ber altirnatîfên civaka demokratîk bigire. Dixwaze sedsala duyem a piştî Saykis – Bîko bi daneheva kirîmînal a talanê ji nû ve qezenc bike û lingên sîstema global ên yekdestarî, çewsandin, bê demokrasî û bê hiqûqiyê, di heyameke bênirxiyê de, bixe gerantiyê. Lew re jî, haya wan jê hebû ku atmosfera piştî hilweşîna rejîma Baas dê bi xwe re şiklekî nû ya pêşbaziya hêzê li herêmê û Sûriyê bîne ku her aliyek dê bixwze valahiyê heyî dagire. Ji bona vê jî, pêşbaziyên li ser axa Sûriyê, bi qasî ku bikevin xezmeta navenda hegemon, bi rolên erkdar û wezîfedar radibin. Tevî ku di wê ferqa misyoneriya xwe de ne, lê baş têdigihêjin ku veguherînên ceostratejîk ên li herêmê û yên di yapiya hegemoniya navendî de, rêya destwerdana hundirê sîstema wan de jî vekiriye. Tirkiyê û Îran jî wê yekê baş dizanin, eger di ya xwe de bi israr bin jî, dê werin parçekirin û biçûkirin. Ji ber vê yekê asta baweriya di nava hêzan de pala xwe daye cihêrengiya berjewendiyan. Îroj jî, Tirkiyê û Îsraîl bi vê baweriyê hatine rûbirûyî hev.

Tirkiyê, piştî hilweşîna Baas, paralelî têkçûna projeya Îranê li Sûriyê, rewşa heyî weke firsendekê ji bona berfirehkirina projeya xwe bi kar tîne. Îsraîl jî dixwaze hevsengiya leşkerî ya nû li Sûriyê weke defakto bisepîne ku ti cudahiyê naxe navbera herdu projeyên Îran û Tirkiyê. Aliyê xwe ve Îrana ku bandora wê li Sûriyê bi ketina Esad re paş ve çûye, Sûriyê weke qadeke nû ya pêşbaziya bi Tirkiyê re dîzayin dike û hewl dide li ser vê bingehê destê xwe yê derve ji nû ve xort bike û pozisyona derbxwarî restore bike.

Bi gotinek din; îroj dewleta Tirk a dagirker hewl dide li şûna Îranê tevayî Sûriyê li gorî xeyalên xwe ava bike û serweriya xwe ya fîzîkî li ser tevayî altirnatîfên xetên enerjiyê yên di Sûriyê re derbas dbin, bike.

Di encamê de, hemû rengên pêşbazî û rikberiya nava hêzên destwerdanê, di oxira perestina berjewendiya elîta desthilatdar de diherikin. Di heman demê de, rêgirtinek li ber altirnatîfa gelan a demokrasiyê ye. Ji vir jî girîngiya banga Rêber Abdulah Ocalan a 27 Sibatê tê ku bi nerîneke nû ya cudayî fikrên ku xwe dispêrin kolekirina bi zorê, çareseriya demokratîk ji bo avakirina jiyaneke azad, wekhev, pirreng û dadmend ku rêzê ji hemû nasnameyên etnîk, çandî, ol û rêolan re digire, pêşkêş dike.

Di heyameke wisa de, banga aşîtî û civaka demokratîk, ku pala xwe daye rêxistina demokratîk, hîmên pêkve jiyana azad, aboriya komînal û hevpeymana civakî ku mafê jiyanê ya hemû gelan diparêze, bi pêşengiya jin û ciwanan, tekane altirnatîfa gelên RojhilataNavîn e.